

Tîrav

WEŞANXANEYA SPÎRÊZ

Xwedyê Imtiyazê

Hafiz Qazî

**Sernivîskar û rêveberê
weşanxaneyê**

Mueyed Teyib

- Pertûka jimare (15)
- Tîrav kurte çîrok
- Pîr Rustem
- Tîpçinîn : Hêvî
- Berg : Beyar Cemîl
- Derhênana hunerî : Nizar Reşad
- Serperîştakarê çapê : Zagros Mehmûd
- Jimara sipardinê : (47) 2002
- Çapxaneya Wezareta Perwerdeyê / Hewlêr
- Tîraj : 500

MAFÊN ÇAPKIRINÊ DI PARASTÎN E

PÎR RUSTEM

TÎRAV

kurteçîrok

Spîrêz

Duhok 2002

Ji

Dê û bavê min re

Êwên ku jiyaneke din ji min

re dixwestin

PÎR RUSTEM

Pîr Rustem

Di sala 1963 an de li gundê Çeqela, devera Efrînê, ji dayîk dibe. Ew çend salên pêşîn li wir dimîne û di dû re mala xwe bar bajarokê Cindirêsê dikin û heya ku xwendina lîsê kuta dike li wir dimîne û ji bo xwendina bilind di zanîngeha Helebê de, ew çend salan li wir derbas dike, lê ji berî ku xwendina endezyariyê kuta bike û di rêza çaran de berdide.

Wî gelek çêrok û gotar di rojname û kovarên Kurdî de belavkirine wek: Stêr, Pirs, Zanîn, Aso, A.welat, J.Rewşen, Armanc, Newroz.. hwd. û heya bi nuha sê berhemên wî yên çêrokan hatine weşîn, ew jî evin:

- 1- Çivîkên Beravêtî – Çêrok , ji weşanên kovara Aso ye, Bêrût – 1992.
- 2- Pilindir – Çêrok , ji we_anên kovara Aso ye, Bêrût – 1993.
- 3- Pûtvan – Çêrok , ji we_anên Merxê ye, Bêrût – 1998.

Mirineke Kedî

Bi tena xwe di odê de ma, bihna pîrekê ji her koşekê hildikele, desmala wê ya reng-rengî ketibû binê maseya ku çend firax avêtibûn ser. Piyala wê ya ku, çay jê vedixwer, hîne mîna pûtekî, li cihê xwe bê deng sekinîbû. Dema dêst davêjyê, şûna lêvsorka wê li ser dibîne. Di aliyê odê yê din de, piyaleke çayê ya nîv tijî danîne, ber bi wê koşê dimeşe û hêdî-hêdî, wêneyên berî demekê kom ser hev dibin û dengê merivê wê yê serdest, ji wê koşê dikşe.

- Ev ên ku li te kom dibin kî ne. Ev bû çend car, ez wan li ba te dibînim û dixwezim ji te bipirsim. Hesenê Îbo, bi dawiya pirsên xwe re, berve pîreka malê dinêre, berkeniya wê nîşan bide ku kêfa wê ji gotinên wî re hatiye û berî mêrê wê bersivên xwe dide, ew dengê xwe bilind dike.

- Ew ên xwarin û gotinên vala ne, ji bilî firotina gotina.. Bêyî ku, pîreka malê karibe kela xwe birjîne ew tê sekinandin û mêrik awirine tûj jê vedide.

- Ne xeme.. Ji mafê te ye ku tu li ser hevalên xwe bixeydî, bes tu karî bêjî ka tuyê çi sûdê ji wan bibînî? Tu

kesekî perîşan û bi tenê ye û eger ne ji mervaniyê ba, min ev şîret li te nedikirin, ne dûre tu van gotinên min di pença wan kî, belkî tu ji xwe dipirsî; ma wê çi ziyane bighînin te. Divê tu ji bîra nekî ku yekî weke min naxweze dengê bi tenê jî winda bike. Wî her ku çend gotin davêtin carekê ber bi pîrekê dinêrî ka ew ji gotinên wî razî ye û dengê xwe dide nik yê wî.

Hesenê Pîrê jî di bin ewrên dûmanên cixaran û gotinên merivê xwe de gêj ketibû. Ev bû çend mehên wî ne ku mala xwe aniye bajarokê Cindirêsê. Di roja ku wî biryar da ku dê barî wir ke, ev mervê xwe kiribû bala xwe ku bi riya wî karekî bi destxîne. Gundiyên wî pesin û rûmeta mêrik digirtin û digotin; wî cihekî bilind li cem dewletê bi destxistiye.

- Ewê ji ku ve min nas bike û li min xwedî derkeve. Dema di civata mal de daxife, bavê wî dengê xwe bilind dike û bi quretî dibêje:

- Law mal xerabo, qey tu nizanî ku ew li ser destên diya te mezin bû û me navê wî jî li te kirî. Van gotinan hinekî dilê wî geş kir û hinek hêvî dane wî.

Di çend rojên pêşî de li wî ne pirsî û dema ku heval hatin ba û li rewşa wî pirsîn, xwest ji wan bipirse; kanî ev kes li kuderê ye û çawa yek kare wî bibîne lê tirsîya ku gumanê bibin ser û bipirsîn; tu wî ji ku ve nasdikî û tu yê li cem çibikî. Ew ne ji pirsên wan ditirsî, lê dê ni-

zanîba çi bersivê bide wan. Lewra ew çêrok, çend rojan, da şûn.

Di roja ku soz da û piştî berger û lomeyên jinikê dê here cem wî, hevalan jê xwest ku hajî xwe hebe û gotin; "Emê hinekî çûn û hatina xwe ya cem te kêmbikin, em di wê gumanê de ne ku cîranê te ne îsiz e".

H. Pîrê di van çend mehên ku mal aniye bajarokê Cindirêsê, sinc û perwerdiyeke nuh hest dike, çi ji aliyê cîran û xelkên bajêr û çi ji aliyê têkiliya hevalan ve; cûdayîke mezin di navbera gund û vê derê de dibîne. Evê yekê hêştî ew hertim gêj û serêşokî bimîne.

- Te ew dît. Yekî çawa ye. Weke min bihîstî hîne xort e û yek nizane ku wî pêncî sal derbas kiriye. Tu dereng ma, sedî- sed wî nehîşt tu bê xwarin derkevî, bes te xwe ji bîra nekiribe ku tu ji bo çi çûbû cem wî û tu dest vala. Bêyî ku karibe gotina xwe bi dawî bike, mêrê wê bi ser de diqêre.

- Te ez gêj kirim, te haje xwe heye te çiqwas pirs kirin. Dibêjin ku yek çel gotinî bi dû hev bêje dê biteqe. Wa ev bû...

- Babetê neguhêre, te çawakir. Ê ji bo min jî, ma te gote wî ku, heya bi rêza şeşan xwendî. Xwedê dikim te ji bîra kiribe. Bi zaravekî tûj gote mêrê xwe û dema mêrik dît bihintengiya wî nema bi kêrê wî tê, destê xwe da sîngê pîrekê û ew ji bin guhê xwe hilkir.

Bi tena xwe di odeya tazî de dimîne, cixareyekê ji ya din pêdixe û her ku xelekên dûmên bilind û fireh dibin, ew di cihê xwe de diçelmise û biçûk dibe. Piştî dehê caran ji çûn û hatina di pêşiya deriyê wî re, cerg kir û carekê- dudwan, gurpînê bi derî xistibû.

- Kî ye. Dengê zirav, ji kûranyê de pirsî.

- Ez im.

- Tu kî yî. Vê carê deng nêzîk bû û berî ew bersivê bide, derî vedibe û riwê keçekê derdikeve.

- Bavê te li male. Bêyî ew silavê lê bike, dipirse.

- Belê, ez bêjim kî ye.

- Bêje merivekî te li ber derî ye. Keçik birih û çavên xwe hildide, li rû û destên vala dinêre. Dema Hesên destên xwe, di piş xwe de vedişêre, keçik bi rûkenî diçe û dêng li bavê xwe dike.

- Gundiyekî te li ber derî ye. Ew dest vala ye. Hevoka dawî, bi ken, dibêje diya xwe.

- Te ew nas nekir. Dê, bê med, pirsî.

- Ev cara yekemîn e ez wî dibînim. Bavê jî xwest jê bipirse ka navê wî çî ye û ew çî dixweze, lê nerî ku keçik derbasî odeya xwe bû.

Hesênê Pîrê dikir ku ji ber derî bimeşe û rê li xwêdana xwe bibire, wî cixareyek kişandibû û ya dudiwan jî xistibû nav tiliyan.

- Bibore, em hinekî dereng man. Bi gotinê re, mêrik de-